

Berlîn, di 9. 1. 1988 de

Birayê Hêja Felek!

Îro min nameya te li gel kerta sersalê wergirt. Her wehaji berî wê jî min hemû nameyên te wegirtin. Ez te li ser rêkirina wan pir sipas dikim. Bi hatina wan ew bîrweriyên xweş û geş careke din tevde dane hildan. Rojgarîyên wisa birastî pir kêmin di jîna Mirovan de. Him sipehîbûna welatê me, bi deşt û newalên wî ve, him jî çiya û sipanên wî ve, her wehaji bi tevaya gul û kulîkên wî ve, pêrejî bi xebata qehremanîyî Pêşmerge ve, van tevan ew rojgarên bihûrî her bi xewnên pir xweş didin xemilandin.

Di nameyên te de zor bi başî liberketim. Her wehaji pêrejî bi wan gelekî dilşad û bextiyar bûm. Di vî warê hanê de ez pir deyndarê te me. Xwezî jî min jî weha bi xîrîbûn ji te re bida nivîsandin. Birayê hêja, di vî warê hanê de li min megir; ji ber ev nexweşîya minî qerte. Ez hêvîdarim, ku ji neha û pêve dê ezê xwe bêtir jihatî bikim û ji te re mîna te her û her bidim nivîsandin. Bi rastî guhestina nemeyan di navbera me de karê bêtir bi bertir û dewlemendtir dike. Xebata meyî îro di warê zanyarî û ferhengî de pêwistiyeke mējûyî ye li ser me ye. Belê ew kilîta dergê çarekirina derdê me ye; jiber veyekê jî divî di vî warê hanê de em şev û rojê têde keftilef, xebat û təkoshîne bikin. Belê hêjî bêtir ji nû ve careke din, lêwê carê ji her car bêtir çarekirina Pirsîyarîya Kurd di Rizgarkirinê û Serxwebûnê de li ser me Kurdan bi hinera pêşveçûna Qanûnên Jînê neçar dike, ku em şev û roj di vê dema vejandinê de Şûreşa Zanyarî û Ferhengî di nava Civaka xwe, belê di nava Kurdistana xwe de berz û bala bikin. Evaya erkê li ser şanê me ye, na hêjî bêtir, Birayê delal, evaya armanca jîna me ye, belê evaya bi rast û durûstî Mirovaniya me bi xwe ye. Weha bi sadebûn, weha bi kurtayî min ji te re tevaya bernameya jîna xwe li ber destên te danî. Ez hêvîdarim, ku ev bîr û baweriyên hanê dê cihê dildariya te bin. Di vê dema dawî de pir Nivîstokên bi nêrx û hêja bi zimanê Rusî li ser Mējûwa Kurd û Kurdistan hatine çapkirin û belavkirin. Weha bi rindî, weha bi başî, weha bi kûr û qûlî li mējûwa me hatiye nerîn. Gend giring û pêwiste, ku bi lez û bez tevaya Welatperwerên kurd wan Nivîstokan bi xwinin û hêjî bêtir ji wan sûd û bexş wergirin. Bê gotîne dê ev karên han dema rêya gihandina armanca me di Serxwebûn û Xweşbûna Jînê de kurttir bike û Gorîyên me kêmtr bike. Ji ber vê jî, Birayê hêja, min erkê Wergerandina wan ji bona Zimanê meyî şerîn û xweş hildaye ser milên xwe. Her wehaji pêrejî li gel wergerandina herdû Bergên Mējûwa Kurd û Kurdistan hildaye ser şanên xwe. Ligel van jî wergerandina Şerfnameya Bedlîsî jî, a Hejar min daye ber xwe. Ez ji te hêvîdarim, ku tu nameyekê ji bona kak Hejar bide nivîsandin, da ew ji bona wergerandina Kurmancî Pêşgotinekê bide nivîsandin; ji ber wergerandina kurmancî ji wergerandina Hejare û dê ew bi carekê li ser wergerandina wîna bête avakirin. Ezê pir kêfxweş bibim, berî ew ji nava me bide koc û bar kirin, vê Pêşgotina Wergerandina Kurmancî ji min re bide nivîsandin; di demeke pir kurt de dê dest bi wergerandina wê bikin. Şerfname ne bes tenê kaniya mējûwa me ye, Serbilindaya Şerfexanê Bedlîsî bi xwe ye. Birayê hêja! Hejar bi wergerandina xwe ve, Pût û Latekî pir bilind, berz û bala di wêjeya me de ji xwe re hîm û qurmkir. Dewlemendbûneke wisa di ziman de dayîte afirandin, a ku ji tevaya bi karanîna Zaravên me tête pêkhatin, ku ew dê her û her kaniya Xeyamê me be, ji bona pêşvexistina zimanê me be. Soran ji vê kaniya mey xweş şev û roj ew dikarin jêvexun, wehaji Kurmancên reben, hejar û perîşan dilbijokin çavdêrin meyê vê kaniya Hejarin. Ez hêvîdarim, ji bona van Hejaran, Perîşanan, Kurmanc û Dilbijokan meya Hejarî xweş bi lez û bez di cama cem de pêşkeş bikim. Birayê hêja! Nexweşîya min hêjî nala berê ye. Ez hêvîdarim, ku kulbûna çavê min carekê ew bête dawîkirin. Lê ev nabe kusb di pêşîya karê min de, lê belê ev bi xwe bêtir û bêtir karê min bi leztir dike. Pir kêmin ji mal derdikevim. Piraniya dema xwe di vî karê wergerandinê de tîrxan dikim. Evaya Dildara mine, Berdilka mine, Qeşeng, Şeng û Şepala mine, xweşbextiya mine, hêjî bêtir belê ev bi xwe nexweşîya mine. Birayê hêja! Ciwan neha di sala dudwa de, di Zanistgehê de, di Beşê Elektironokî de ye. Ew di xwendina xwe de pir jîr û jêhati ye. Weha wîna ji min re ev bernameya Nivîsandina Zimanê kurdî li ser Kompiyuter daye çêkirin. Ev Bernameya hanê zor yarmetiya mindê. Berbera pir silavên wê ji we tevan re heye. her wehaji zor silavên min, ên Berbera û Ciwan ji bona Kak Mesud, Alî û

hemû Hevalên din her yek bi navên wan heye û ez hêvîya sersaleke xweş û bi serketî ji tevan re daxwaz dikim. Her wehajî silavên me ji bona Pîrekaşte heye û ez tîm çavên Zarokan. Min Amanetê xwestî ji bona Pîreşeng rêkir. Hûn tev xweş.

Ezê pir kêfxweş bibim, ger tu karibî ji min re Tarîxa Kurd û kurdistan bi Kurdî bide rêkirin. Herdû bergên Erebi *li nik* min hene. Ez vê daxwazê ji te dikin, ji ber ez dixwazim wan wergerînim Zêravayê Kurmancî.

Birayê te.

Salih

Berlin, di 30. 8. 1989 de

### Birayê Hêja Felek!

Ji mêj de min di xwest, ku ez ji bona te bidim nivîsandin. Min her car pîrsa reuşa jîna te ji Heval û Nasan dida kirin. Her wehaji min çavdêriya nameyên te ji xwe re dida kirin.

Ji bedbextiya nezaniya me pir derd, es, kul û ketin di mêjûwê de bi ser serên me de hatine ketin. Hêji em girtiye nezaniya xwe ne. Hêji û her û her bêtir ji em pir ji têgihistina naveroka Pirsîyarîya xweyî Millî û çarekirina wê dîrin.

Min bi wîrdî, hâr û kêrî Nivîstokên tayî pêkirî ji xwe re dane xuendin. Ez pir bi wan dilşad û bextiyarbûm. Li gor bîr û bawerîya min tu pir bi başî li ser çarekirina Pîrsa Welatî dide nivîsandin û Her wehaji tu bi sêdebûn û digarî tevaya cevhêra wê ji bona Xelkên Kurdistanê re dide derxistin. Bi nastî evaya cevhêra karê, Zana û Şiyarvanên Kurdistanê di vê qonaxa meyî mêjû bi xwe de ye. Divê em şev û rojê vî Miletê Bedbext li ser mêjûwa wî, li ser reuşa wîyî siyayî, li ser rûdanên dorhêla wî, li ser zînetê Cêhanê û hêzên, têde kêrkirî bidin agehdarkirin, da ku ew bi kurttirin dem û kêmtirin gorî bi serxwebûna welatê xwe bête gihastin. Evaya karêkî pîrî dujwar û sengîn têde dîtin, lê tevlivêji em bivên ganjî nevên, evaya bi xwe jî jîn li ser me dide neçarkirin.

Ez li gel Heval û Biraderên me li ser reuşa meyî nuh pir axivîm. Bi digarî têde derketin, ku belê dîr yanjî nêzik di vî warê hanê de jî bîr û bawerîya min û ya te pir nêzikî hev in. Ez hêvîdarim, ku di vê roja teng de dê em tev bi hev re bikaribin xwe bi serfirazî, serbilindî, bi zanebûn û dilsozî bidin rizgarkirin û bi armancê Welatê xwe bêtin gihastin.

Xwezî tu, ger ku demeke kurt jî ba, bihata Ewropa; ji ber dîr yan nêzik tevaya xebata Kurdistanê ji bona demeke kurt li Ewropa bi neçarkirî têde civandin û ji vir carekê din bi şeweyekî zanistîyî pîrî xurt li ser bingehê demokrasîkirina Pirsîyarîya Welatî ji bona Kurdistanê bi hêviya biserketina xwe ve têde veşandin. Ev pêla me rûpelekî nuh ji bona xebata me bi neçarkirî dide vekirin û ew vê carê nema ne ji Iranê, Turkî, Iraqê û ne jî ji Surî têde destpêkirin, lêbelê ew vê carê ji Ewropa û li ser serpêhatîya tevaya demên vejandina Miletên din têde avakirin. Bi vî rengî di mêjûwa xebata me de carê pêşîye, ku biserketina me di Serxwebûna Welatê me de bi hêvî têde dîtin.

### Birayê Hêja!

Min û te zor li ser oîhê şiyarkirina Millî dayite axivtin, ku bêtir vîna dê her û her Rêberê me Nezanê me bin û dê her Nezanê me Rêberê me bin. Rêber ji ezmanan nayêtin xwar, lêbelê ew ji nava Miletê xwe têtin derketin. Ew bi xwe jî wêneyê zanebûna wî bi xwe ne.

Di vî warê han de oîhekî pîrî mezin ji Zimanê Zikmakî re ji bona vejandina şiyarkirina Millî têde wergirtin. Milet bi gelemperîya xwe ve divê li ser mêjûwa xwe, li ser Zînetê xwe bête şiyarkirin. Bêtir vîna dê em her û her di nava bazinê nezaniya xwe de bêtin gerandin û surandin û hêji bêtir bi serdeji dê emê her û her di nava Welatê xwe de, di nava xwîna xwe de bêtin vegezandin.

Meha piştî remankirineke pîrî dîr û dirêj ez ji Berlinê ji bona Bajarê Monîxê ji bona nik Kak Serdar Araratî çûm, da ku em bi hev re Kovarekê Kurdîyî Mehane bidin derkirin, da ku têde bi şeweyekî Zanistî û li ser bingehê Demokrasî li ser çarekirina Pirsîyarîya Kurd bête nivîsandin. Meha bi vî rengî dê ew dergehê xwe ji bona tevaya Zanevanên Kurdistanê bide vekirin û bîr û bawerîyên wanî cuda li ser rûpelên xwe bi de derxistin.

Li ser Zanistîkirin û Demokrasîkirina Pirsîyarîya Kurd di Kovarekê Kurdî de li Ewropa ez û Kak Serdar di 19. 8. 1989 de bi hev hatin gihastin. Ku em kovara

xwe di nêzîka wê mehên tèn de pê bidin destpêkirin. Ew nala Xwedîyê wê Kovarê û ez jî nala Serniyîskar bête destnîşankirin.

Meha ez hêvîdarim, ku tu jî bi hemû tuwana xwe ve rûpelên vê Kovara hanê bi bîr û baweriyên xweyî pir bi nax bide xemilandin û dê tu her û her li dîhev jî bona Kovara me îlâverînen xweyî pir dirêj li ser rewşa xebata Kurdistanê li gorê bîr û bawerîya xwe bide rêkirin. Ger ku tu wan bi tîpên Latîni bide nivîsandin, weha emê wan xweser bi wî corî bidin belavkirin. Ger tu bixwazî, ez wan jî bona kurmançî bidim wergerandin. Xwezî me bi tîpên latîni bikarîba bi herdû Zaravan Kovara xwe bide derxistin. Her wehaji ez jî te hêvîdarim, ku tu dê Nivîsvanên kurd li dora vê Kovara hanê bide civandin. Hûn tev li ser navnîşa min li gel vê Kovarê di karin bidin dan û sitandin.

Silavên xwe, yên Berbera û Ciwan pir jî bona Hevalan tevan û jî bona Malîya te em didin rêkirin. Ez tîm çavên Zarokên te. Ez çavdêrê, banderawê berseva te me.

**Birayê te**

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]

[Faint, mostly illegible text]